# IRAK | IRAQ

## USCIRF–RECOMMENDED FOR SPECIAL WATCH LIST

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya DY (USCIRF) encûmeneke azad û cotpartîyî ya DY ye ku di seranserê dinyayê de çavdêrîya serbestîya dînî û bawerîyê dike. USCIRF-a ku li ser hîmê Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) yê 1998ê avakirî ye, di seranserê dinyayê de ji bo çavdêrîya binpêkirinên azadîya dînî û bawerîyê de standardên Navneteweyî bi kar tîne û ji serekî, wezîrê karen derve û Kongresê re salixê şîretên siyasete pêşkêş dike. USCIRF, dezgeheke ji Wezîrîya Dewleta DY cuda ye û azad e. Raporta Salane ya 2020ê encama xebatên yek salekê ya bibelgekirina binpêkirinên qadê û şîretên siyasetên ḥikûmeta DY nîşan dide. Raporta Salane ya 2020ê heyama ji Çileyê Paşîn ê 2019ê heta Çileyê Pêşîn ê 2019ê digire nava xwe lê di hin rewşan de hin bûyerên giring ên berî yan piştî vê heyamê jî tên xuyandin. Ji bo zanyarîya bêtir li ser USCIRFê li vê lînka sîteya înternetê binihêrin yan jî ji jimara têlefona 202-523-3240ê bi USCIRFê re êkser pêwendî daynin.

## BIDESTKETÎYÊN HÎMÎ

Di 2019an de li hin herêmên xuyayî yên Îraqê rewşaserbestîya dînî çêtir bûn lê bi tevahî bifikar dewam kirin. Kêmanîyên (eqellîyatên) dînî yên li deşta Nînovayê û Sincarê di demeke kurt de ji bo vegera ewle, di demeke dirêj de jî li ser mijara jiyaneke ewle û daîmî bi astengîyên mezin re rûbirû man. Hêzên çekdar ên ji hevkarîya pêşmergeyên Kurd, sepeya DY û hevkarên pirrneteweyî pêkhatî, di dawîya 2017ê de her çend bi serfirazî dawî li gefa DAÎŞê ya herêmê anîbin jî, di 2019ê de li gelek herêmên ku ev koma terorîst xistibû destê xwe, berê jî nifûsa dijîya pirr kêm bû yan hîç tune bû. Alîkarîya însanî ya DY û xwebexşên din ên Navneteweyî li van herêman destekê dan jinûveavakirinan û tevgerên îstîqrarê, lê bi deh hezaran medenîyên endamên kêmanîyên dînî û nîjadî hê ji di xeterê de bûn. Pirranîya Filehên Îraqê hê ji nikaribûn vegerin malen xwe û herweha piştî vegerê jî zehmetîyên bi wan re rûbirû diman, gelek mezin bûn; 500.000 Êzîdîyên ku di 2014ê de ji ber zordestîya DAÎŞê revîyabûn, rûbirûmayîna wan a bi zehmetîyên ciddî re dewam kir. Jana dilî ya komî ya ew ji ber zordestîya DAÎŞê pê rûbirû mabûn, bi pirranî neçar ma; wek nimûne bi aqûbeta hema hema 3000 jin û zarokên revandî yên Êzîdîyan nayê zanîn. Di lêpirsîneke Encûmena Bilind a Neteweyên Yekbûyî (UN)ya Penaberan de, bi IDPyên (cîhguhertîyên) Êzîdî yên bi wan re hatiye dan û sitandin de, bi tenê %3yên IDPyan difikirîn vegerin Sincarê; hindek kêm îsbat hene ku ev jimar paşê bêtir bûye. Herweha tevlî îhtîcacatên li bajarên Îraqê û tundîyên pirrneteweyî yên li bakurê rojhilatê Sûrîyeya cîran, ên ku dîsa pêkhatî jî hin faktêrên tevlîhevîyê zehmetîya avabûna îstîqrara li bakurê rojavayê Îraqî bi awayekî dilêş nîşan da.

Dema mirov bi hemî faktêrên din re muqayese dike, bi taybetî nebûna ewlehîyê ya bi pirranî ji ber çekdarên Yekîneyên Seferberîya Gelî (PMU) *(Heşdê Şe'bî)* ya bi desteka Îranê, hê jî nehişt rewşaazadîya dînî çêtir bibe. Digel tevgerên nejidil ên xistina wan a binê çavdêrî û berpirsîyarîya hêzên çekdar ên Îraqê, PMF bi pirranî tevgerên xwe yên bêperwa dewam kir. Hin komên bi desteka Îranê yekîneya 30î ("Şebek") û a 50yî ("Babîlon"), li kêmanîyên ku vegerîyane herêmê hin bajarokan welê dikin ku êdî tê de nayê jîyîn yan jî tevgera wan dî navbera wê herêmê û herêmên din de sînor kirin. Hin ji wan koman, serê Filehên Bartelayê, Qereqûşê û hin ên vegerîyan deverên din êşandin û gefxwarinê dewam kirin; wek nimûne di meha Îlonê de di dema dibîranîna Mislimanên Şî'î ya 'Aşûrayê (jixwe di civateke ku tengijînên mezhebi tê de hebûn tevgereke kişkişkirinê bû) de yekîneya 30yî ji Filehên Bartellayê re qedexeyîya derketine derve pêkanîn. Tevgerên van her du yekîneyan gihîşt asteke ew çend ku di meha Temûzê de Wezîrîya Gencîneya DY li dijî serekên koman Waad Qado û Rayan al-Kîldanîyî pêdankirinên Magnîtsky yên Gerdûnî pêk anî.

## LI HIKÛMETA DY ŞÎRETIN

- Li gora Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) ji ber bi awayekî ciddî binpêkirina azadîyên dînî yan jî çavgirtina jê re, xistina Îraqê nava Lîsta Taybet a Çavdêrîya Wezîrîya Derve ya DY;
- Wek perçeyekî pêwendîyên dualî yên payebilind, ji ḥikûmeta Îraqê re li gora siyaseta wê beyan kiriye, PMFê û bi taybetî jî komên ku her car tundîyên mezhebi pêk tînin û nahêlin Êzîdî, Fileh û pêkhateyên din ên dînî û nîjadî yên li Bakurê Îraqê ne vegerin û bên tenduristkirin û ji wan re astengîyan derdixin û/yan li gora berjewendîyên Îranê dest diavêjin xwenîşandanan, bên rawestandin û pê bê kirin ser wan;
- Li dijî serekên ku tevgerên çekdarîyê bi rê ve dibin, pêkînana pêdankirinan; bi vê mebestî bi pêwendîdarîya mafên Mirovan ji desthilatdarên aborîyê û vîzeyê re danzanîna binpêkirina xuyayî ya van kesan û bi vî awayî destdanîna ser hebûna warê wan û astengkirina wan a ketina DY;
- Bi serekkomarê DY Berham Salihî re û serekwezîrê bê ser wezîfeyê re di pêwendîyan de nîşandayîna azadîyên dînî û tendurustkirina kêmanîyên dînî û nîjadî yên bêparastin ên welêt û parastin û temsîlkirina wan kirina pêşîktîyê û pêkirina ser van birêvebiran; û

- Bi rêya serekên wan ên temsîlkar ên siyasî û medenî, alîkarîkirina xurtkirina parastin û xwedîtîya kêmanîyên dînî û nîjadî yên Îraqê û wek tiştekî ku ji bo vê yekê bê kirin; êdî ji bo Deşta Nînovayê mijara birêvebirinê û çaroveyeke ewlehîyê ya temsîlî bi awayekî berfireh guftûgokirin.

## JÊDER Û ÇALAKÎYÊN HÎMÎ YÊN USCIRF-ê

- **Serdana delegasyona emcûmenê:** Di Temûz-Tebaxa 2019ê de li Bexdayê tevlîbûyîna kombûna dibîranîna tovkujîya DAÎŞê ya 2014ê ya Êzîdîyan
- **Rûniştin:** Têkoşîna Mayîna li Îraqê ya Kêmanîyên Dînî
- **Nûkirina Siyasetê:** Li Bakurê Îraqê Parastina Kêmanîyên Dînî

## Piştperde

Îraq, welatekî pirrcûrî yê dînî û nîjadî ye lêbelê di encama bêîstîqrarîya siyasî ya di dema çûyî ya welêt de, tundîya mezhebî û serîhildana Îslamî de ev pirrcûrî kêm bû. Gelek ji Îraqîyan xwe wek Misliman bi nav dikin; %64-69ê wan Mislimanên Şî'î û %29-34ê wan Mislimanên Sinnî ne. Welat di heman demê de şûnwarê hema hema 200.000 Filehên ji komên Katolîk, Ortodoks û Protestan (berî 2003yê ev nifûs hema hema 1,5 milyon bû) û 700.000 Êzîdîyên ku gelek ji wan neçar man koç bikin cîhên din ên welêt bû.

Di çarçoveya Îraqê de dîn û nîjad bi pirranî bi hev ve girêdayî ne. Di salên paşîn de pirranîya komên biçûk ên wek Sabîî-Mendaî, Turkmen, Kakaî û Şebekan, bi gefên giring ên ku mirov nikare wan bi hêsanî wek bi temamî dînî yan bi temamî nîjadî bi nav bike re rû bi rû man. Pirranîya van komên piçûk (tevlî Êzîdîyên ku bi hezaran endamên wan ên jin û zarok ji bo bendetîya cinsî û malê hatin revandin û Tirkmenan) di binê Birêvebirîya DAÎŞê de zehmetîyên gelek mezin kişandin, yan revîyan yan jî ji bo ku li Îraqa piştî DAÎŞê cîhê xwe bibînin hê jî şaşomaşo mane. Di nava van de hin ji wan ên di nava welêt de wek penaber (IDP) ne, her çend bêkêmasî nîn be jî bivê nevê sitargehek îstîqrar li nêzî komên xwemalî yên Hikûmeta Herêma Kurdistanê (HHK) bi dest xistine; hin ji wan jî hêdî hêdî dixwazin dîsa vegerin bajarok û gundên xwe yên hêdî hêdî lê bi awayekî daîmî û teqlîdî dîsa ji nû ve tên avakirin.

## Piştî DAÎŞê Tendurustkirina Kêmanîyên Dînî yên li Bakurê Îraqê

Di 2019ê de jêderên li Îraqê ji USCIRFê re gotin ku ji têkçûna DAÎŞê ya 2019ê ve dibe hema hema %30-50yê Filehên Kildanî, Aşûrî û yên din (bi pirranî ji herêmên Hewlêrê û HHK) vegerîyane şûnwarên xwe. Herweha gelek ji Êzîdîyên ji ber zordestîya DAÎŞê revîyayî, li kempên IDPyan ên Dihokê; ser serê Çîyayê Sincarê radiwestîyan yan li deverên din li sirgûnê bûn. Sincara ku şûnwara wan a kevnare bû, ji bo vegerîyayîyan bi pirranî êdî ne cîhê jîyanê bû ji ber ku cîhên kontrole yên PMFê rêya di nava Sincar û Dihokê de carna dikir cîhê nekarîna buhurînê, zirarê dida jêdera wan aborîyê û nedihiştin debara xwe bikin, êdî nikaribûn xwe bigihînin Mûsila ku ji bo mal û xizmetan bivê nevê ye û tirsa ji nû ve zindîbûna DAÎŞê gelek belavbûyî bû. A hê xerabtir, Di Çîrîya Pêşîn a 2019ê û Çîrîya Paşîn a 2020î de tevlî hin bûyerên paşîn jî, firokeyên şerî yên Tirk ji 2017ê ve cîhên Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) û hevkarên wê car caran ji xwe re kirin mebest. Gefa dewambûyîna êrîşan kir ku şikestina ewlehî û îstîqrara vê herêmê bêtir bû.

Di seranserê 2019ê de civata Êzîdî, ji ber ku li dijî zordestîya 5 sal berê 'edalet neşîya pêk bê, xemgîr bû. Ji 2017ê ve mehkemeyên Îraqê bi hezaran gumanbarên DAÎŞê û bi pirranî jî dadgehkirîyên Mislimanên Sinnî bêtîrî delîlan bi danzanînên bi zorê dane kirin, mehkeme kirine. Nuqteya herî hêja ya di sîstema 'edaleta heyama buhurê ya Îraqê de ew bû ku mehkemeyên li Parêzgeha Nînovayê bêtirî danzanînên bi zorê, bi awayekî belavbûyî yê tirsnak wergirtî, tevdigerîyan ku li gora standarde îsbatê tevbigerin. Lêbelê dadgehê ji daxwazên mehkemekirinên ji ber sûcên şerî yên Êzîdîyan ji bo şervanîn DAÎŞê re çavê xwe girt. Ev be'edaletî, tevgerên navneteweyî yên ji bo bibelgekirinê jî ji nêz ve 'elaqedar dike; ji ber ku Komxebata Lêkolîna NY (Neteweyên Yekbûyî) ya ji bo Destekkirina Dayîna Hesabê Sûcên ji Alîyê Dewleta Îslamî ya Îraqê û Şamê/DAÎŞê (UNITAD) di Adarê de li Sincarê û dora wê dest bi xebata li ser bermayîyên Êzîdîyên qurbanîyên DAÎŞê derxistina gorên komî kir.

## Li Îraqê Arîşeyên Din ên Azadîya Dînî

Di 2009an de li herêma HHK rewşaazadîya dînî li gora salên bere bi awayekî mezîn bi îstîqrara dewam kir; digel hin arîşeyên wek çarenedîtina ji statuya milkên hin Filehan re, pirranîya Misliman û kêmanîyên din ên dînî eger bi beşa mayî ya Îraqê re bê muqayesekirin, di dereceyeke maqûl de xwedîyên rewşeke azad in. Pêwendîyên di nava HHK û Hikûmeta Îraqa Federal de piştî tengijînên giştpirsîya azadîyê êdî hinbihin rast dibin û keysê dan ku tevgerên hevkar ên dijî DAÎŞê bên destpêkirin û bi wî awayî li Îraqê li herêmên nakok ev demeke dirêj e potansîyela bêîstîqrarîya civatî û siyasî ya li azadîya dînî gefên ciddî dixwe, kêm dibe.

Li herêma Hikûmeta Îraqa Federal, reformên wek lihevkirina di nava Mislimanên Şî'î û Sinnî, yan komên din ên dînî de yan jî bernameya çavdêrîkirina li ser qutabxaneyan ên destekkirina

pirrcûrîya dînî li gora salên berê hindik hatin dîtin. Yasayên derbarê heqaretkirina li nirxên dînî û guherandina dînî bi miqdarekî mezin wek xwe man û dannasîna fermî yan azadîya perestinê ya ji bo berfirehtirkirina ji bo tevlî komên dînî yên piçûk ên wek Bahaîyan, Şahidên Yehovayî filan pêk nehat.

## SIYASETA HÎMÎ YA DY

Di 2019an de li Îraqê siyaseta DY ya yekserî yekser bi rewşa azadîya dînî ve peywendîdar e, di hîmê xwe de alîkarîyên însanî û pêdankirinên taybet dixist nava xwe. Di Çîrîya Paşîn de Nûnertîya Geşepêdana Navneteweyî ya DY (USAID) bi rêya nîvekarên xwe yên Îraqî û civata medenî ya navneteweyî, ji bo bixwevehatin û ji nû ve avakirina jîyana qurbanîyên DAÎŞê 400 milyon Dolar veqetandibûn. Hikûmeta DY ji bilî van li ser serekên PMFê, siyasetmedarên gendelîyê û kesên din ên bi taybetî azadîya dînî û/yan bi awayekî berfirehtir mafên mirovan binpê kirine, tedbîrên cezakirinê bêtir kirine. Tevlî du serekên PMFê yên berê binavkirî, di Temûzê de Wezîrîya Gencîneyê, ji ber sersarî û gendelîyên du siyasetmedarên bi navê Newfel Hemmadî Elsultan û Ehmed Elcuburîyê li parêzgehên Nînovayê û Selehedînê yên li ser kêmanîyên dînî û pêkhateyên din bandorên ne baş dikin, xistiye lîsta “welatîyên bi taybetî xuyandî”. Di meha Çîrîya Pêşîn de Wezîrîya Gencîneyê pêdankirinên Magnitsky yên gerdûnî fireh kiriye berfirehtir kiriye û siyesatmedarekî din î gendelîyê û sê kesên cuda yên ji bo Îranê serektîya komên çekdar dikin û li dijî xwenîşandêrên tevlî xwenîşandanên li dijî Îranê û hikûmetê bûne yekser alîkarîya tundîyê kirine xistiye nava vê lîstê. Hema piştî dewra raportkirinê di 3yê Çileyê Paşîn ê 2020ê de li Bexdayê di êrîşên DY yên hewayî de du kesên di tevgerên PMFê de roleke wan a giring hebû hatin kuştin: Serbaz Qasim Silêmanîyê serdarê Hêza Qudsê ya bi Sepeya Parêzkarên Şoreşa Îslamî ya Îranê ve girêdayî û alîkarê serbazê PFMê Ebû Mehdî Elmuhendisê avakarê çekdarên Ketaîb Hîzbullahê.